

ESMER

Li wêderê, kêderê ku çîyayêd bilind bi qefa û zinar hilparikî ezmana dibû, li kêderê ku ewurê reşe tarî kerî-kerî li serê çîya xurdibûn bi hêwra giran, û usa şirin dizingirî bayê hênik, çewa li mêşê himber govenda teyîreda dikir wîtn bi dengê şîrin.

Li wan gerr û guhêrra dixulxulîn avêd belekîyê berfa û çevkanîya dilezandin berbi bestê deşta fire. Ji her kendalekî, ji berwara û pêhevraza, xuşînê cewukê ava dihat, ew ji hevraza bejêr dibezîn, gava ku tev hev dibû, telp digirtin giran dikişîyan û gava ku dîsa berê wan diket pêbejêra, kevir û kuçika bi xwerra rapêç dikirin, dibû zirimîn bi kerb û kîn.

Usa bû ew zozana serhedê: li milê rastê mêşekî six bû, li milê çepê çîya bû, bi gul û sosinê awaz-awazî pir xemilî. Ê ew çîyayê usa bi gul û sosin xemilî, qefa û zinarê wî bi ewur û ezmanara xeberdîdan, di nava sal û zemanê qerîna bi birînê xedar zer û zinar ji hev qelişibûn, bilindayîke tarî û xalî bû. Ji gerra wî çîyayî tevê usa diqijiland, wekî berî wedê xwe biharê, gul û sosina belgê xwe raxistibûn bi bîna qudrêtî ew best tijî bûvun, meriv hewas hijimekar bû, têr lê bigerre û bîne veçine, çiqas şîrin dihat betê hênik bi bîna gula, sosin û rihana perwedekirî, nayê gilî kirin.

Mêş û moza li ser belgê dara raw girtibûn vizîna wan bû, mergîskê û ruhberê biharê tamam ruh, berda hatibûn, dilipitîn çarnikal, şaya ruh veğerandina xwe dikirin, ya emirê teze çar nikal, li ber devê ava, li ber qelşê kevira û li ser belgê dara....

Ji berpala çîyê, raw girtibû kerîyê şivan, bizinê isturu, xişt çîndik kiribûn li ser qefê zinara û li ser serê wan, zerê bilind kubar-kubar berjêr li gerrê û kerîyê mîya

dinhêrîn yê ku raw girtibûn giran diçêryan, vîyalî-wîalî hêşinayê biharêyî teze meqes dikirin û nav nava li bizinê hevalê xwe bê ebûr dinhêrîn, yê ku xwe dabûn çingilê jorin, jorda li wan dinhêrîn.

Kerîm lingekî xwe dabû bin xwe, lingê din ji ber xwe derdabû û serê seyê gurrêx danîbû ser çonga xwe û bi dengê zîz qîrrîna bilûra wî dihat, çiqas diçû, ew qas zîz dibû dengê bilûra wî. bi miqamê şîrin quvîna bilûra Kerîm, ew best girtibû, te qeyî digot wê lezê kevir kuçik gul, sosin rihan û beyîbûn, teyîr û terawulê mêşe, tev bi hevrra kerr bûne guhdarîya miqamê Kerîm dikin.

Ew qîzê ku li kêleka çem rûniştibûn, lingê xwe dişuştin, aha, wana ling, ser û çevê xwe şuştin, kuta kirin, çing kirin banzdan ser kevir û zinara, berê xwe dan berpala çîyê... daw û dêrê wan, kesk, sor, şîn û qîçik, sipî û zerda birr bi rengê gul û sosinê neqebêrra xeber didan, xemila xemilê, tijî dikirin rengê awaz.

Esmera esmerî, xwîdana enîya kever, bi zenda zer paqîşkir û çaquya xwe kûr di ber pişta xweda nikand, xandoq û siping tijî pêşa xwe kir, çapik û çeleng pêhevraz bû.

Dengê bilûrê diha bilind bû, miqamê bilûra şivîn dil dihejandin, berbi xwe dikişandin, sewta bilûra Kerîm, sewta evînîya dila bû.

Ji wan qîza çend çûn ketin nava pêz û vîyalî-wîyalî pez dane bêr, refesa guhanê mîya girtin di erdêda dotin, şîrê mîya bi ser çevê hev reşandin, di berwarêda li milkê pêz hev kepeseyî kirin.

Esmerê, nêzîkî bi kerîyê pêz dikir, Kerîm gava ku Esmer raçev kir serê seyê gurêx wêda def da, bihecam zor da dengê bilûrê.

Çevê Esmerê jî kenîya guleş çirûsîn, hinarê sûretê sor, notila du sêvê xirtizê, bûne gulok gava ji şabûna devê mewîjî bi ken vebû, diranê sedefî berra xwanê kir, notila diranê kara xezala, -hiz bike ji hizkirî, di dilê xewda wekiland Esmerê. Sifetê

şivanî guleş, çev û burîyê wî bedew bi miqamê şirinra tevayî usa li Esmerê rûdinişt, usa lê xweş dihat, wekî dil û ceger lê disût, têt bi têt tamarê xûnê di hundur Esmerêda direqisîn ji şerim û şabûnê sûret lê qimilîbûn, ewê ew deşta fire ji xwerra teng hesab kir. Teva biharê zatê namil li Esmerê diqimiland, xûn di wêda dike lijî, agir û alava qefes kirina dilê wêyî tenik gurr bûva, notila gogerçîna ser zinara, ew nişkêva kete qefesê û çar sale wekî di wê qefesê, wê telikêda çurumîş dibe, û wê lezê, gava ku Esmerê, qefes çikênandibû, gava ku nêzîkî hizkirîyê dilê xwe dibû... Esmer li pişt xwe dinhêrre, kamê? Keçik naxwênin, kî? Zane ketine kî qulçî û cesûsîya wê dikin...oh, de bira xwe bitelînin, cesûsîyê bikin, çiqasî dilê wan duxaze, teva biharê diha nehêle, wekî ew dilê nazik qefes bike, wê hizkirina şêrin perde bike, tu cara, tu cara ewê ewqasî xwe bîr nekirîy, tu cara şewata dilê xwe usa gurr nînbîye, çewa wê sala paşin, tu cara ew usa bi culhet nêzîkî qirara xwe nebîye, çewa vê lezê. Oh, helo wê biharê tevê çirra? Usa diqijiland, çirra? Usa fenabû, wekî dinçand Esmerê niheqîyê bike....

Û gava ku bilûra Kerîm, dengê xwe vebirî xeberek ji dev û lêvê Esmerê şekirî firrî, hizbike- ji hizkirî, deqekê dev û lêvê şekirî fire vedibin, diranê sedefî notila diranê karê xezala dibiriqin, ew guleş dibe û dikene, hêja bi dengê wê zîz û hizkirina ezîz gerr û guhêrr dizingire, nûr û neder a wê di dilê Kerîmda dişuxule, Kerîm li sifetê Esmerêyî bedew û li çevê wê notila ezmanê sayî zelal, mêze kir, bi dilê avêjok nêzîkî wê bû.

-Esmer.

Dilê Esmerê jî avît reqisî, ewê serê xwe hejand, te qeyî digot ew tirs û xofa ku heta wê wextê ew qepeçe kiribûn, ji xwe dawuşand wêda avît, wêda avît qend û bendê edetê kevine bê oxir û pêşa xwe berda jê rijîya pincara çivî, Esmer xwarî erdê bû ji nav wê pincarrê kulmek xandoq hilanî û bi dil û reza dirêjî Kerîm kir.

Kerîm destê Esmerê bi herdu desta girt, givaşt, xandoq, yek bi yek gulolî erdê bûn, ew hêdî-hêdî nêzîkî Esmerê bû.

-Axir çi çax? –Kerîm bi keser pirsî.

-Çi çaxê? Ejî nizamim, wekiland

Esmerê bi dengê melûl caba pirsî Kerîme nişkêba da û aza dest bi dilê xweda givaût.

-A... Esmer, -bi lez wekiland Kerîm bi dilê baristana- axir ez çiqasî sebir bikim, û nişkêva sûretê Esmerêyî notila sêva xelatê da ber ramûsana, Esmer diricifî notila meya nav avê.

-La min heç tedayê, -wekilî dengê qîzekê û ji pêrra kulma xwe tijî şîr bi ser çewê Esmerê reşand.....

Dîsa êvare, dîsa Welî hate hundurr odê, li ser mîndera xwe nerim rûnişt û bû fiştîna qelina wî, dû li ser milla bû gêjgerîn, çevêd xware tijî xûn kuta çevê Esmerê, di bin pozê xwerra girrijî, hizingê kûr rahiştin û Esmer da ser çonga xwe.

Temam çar sala ewî wa buhartîye. Wê çaxê Esmer 16-e salî bû, hela qîzeke amin û tamin bû, ji dunîyayê bê xeber.

Heta wî yaşî Mistoyê belengaz heger zivistanê. Heger biharê ji dêrekî çît zêdetir tiştêk li Esmerê nedikir, zatî xarina wê jî hine dewê tîrş û toraqa eyêr bû, nav-nava ji mala Axê hine hûr-rrûvî, pişik û cegerê pezê şer jêkirî dihat mala Mistoyê belengaz, lê nişkêva hertişt hate guhastinê. Vê gavê Esmer kare xas û qumaşî jî li xweke, sol û gorê bajêrr jî bike pê, û hela serda rojê beqdadîkê dide serê xwe. Sirîya ewulin evana gişk lê xweş dihat, Welî jî şevê heta sibê li dora Esmerê diçû dihat hemêz dikir, dalist ji sêrî heta linga, lê hela jê têr nedibû....

Sal bi sal Esmer ji hev derdiket, notila gula derbiharê vedibû, meriv hewas hijmekar bû li wê, çev burîya qaş û qelema dêmê gulî, ordama şîrin, awurrê çeva mêzeke, lê Welî roj bi roj di xweda diqicqicî dikelijî notila pilingê har şevê heta sibê fikir errîn, li dora lingê Esmerê diçû dihat, fikir devê xwe û nav-nava hulkum dikirê, tewlebaz dida xwe, bê hemdî xwe ji hal û qal xeber dida, oyînbazî dikirin, dibû axe-axa wî, ofe-ofa wî, dinelîya dikalîya û car din li dora Esmerê diçû dihat, ji kêlekekê weldigerrîya kêleka din, dibû erîna wî. ...

Gava ku ron dibûn-şevêd usaye bi kul û keser, Welî bi kîn û buqzê li Esmerê dinhêrî, sibê heta êvarê, derî li ser dadida çewa girtî û tenê wextê nan ew bîr danîn.

Îlahî vê sala paşin Welî lap har bûvû, ew çend cara çûbû bajarra û vegerrîyabû, gava ku ji bajêrr vegeerîyabû hertim ewî şevê usa gosirmat buhartibûn, sivetirê jî derî diha qewîn li ser Esmerê dadabû.

-Ezê 14e sala jî xweyîkim, lê nahêlim ji hundurr derkeve, rûyê evda bivîne, - Esmerê rojekê bihîstibû reva gef û gurrê wî, wajî başe, wajî Welî kare timê kel û şewata dilê xwe, birrêje. Bihara bîsta nêt û mitalene mayîn ji Esmerêra anîbûn, lê bona Welî ew bihara bîsta weke hercar bû û hela diha xweş û hêsa weke hercar, ew herça ku li Welî xweş dihat, lê li berçevê Esmerê reş bû, wekî mer.

Û roj bi roj peyî dibû dil û cegerê Esmerê, Welî jî rihet nedima, dil û ceger ewî jî li xwe dikot.

Esmer diha xwe nas fikir, diha ne ew qîza sivike ji dinê bêxeber bû, niha ew bi fikir û zanbûn duşurmîş dibû... Welî eva yekana fem dikirin û diha bi kînê û kumrreşîyê tijî dibû.

Aha îro çevê wî dirreqisin, çenê wî dûzan kirî sîqîn jê tê notila gurê çille, diranê xwe diçîrrkîne, qamçîyê desta di destê xweda werba dike û ji hêrsa dişîriqîne saqê

sapoka, diçe hundurr odê, Esmer qutîyê huldişîne, her neyîse cîdide, Welî nêzîkî Esmerê dibe, kef bi dêv ketî notila hespê şîret kirî, Esmerê li erdê pendike, bi dest zalim tê nav çevê Esmerê, bi gulîya digire bide, ku tu didêyî heta millê wî radibe, heta qeweta wî heye Esmerê dihincirrîne.

Qîza mirtiba, tu qîza kuçikê birçî, axir te çewa culet kir, wekî navê Welî li erdê xist, tu namûsê dikî laka pûştta, erê ne?

Ling û kêlekê Esmerê ji zerpa qamçîya dicivin ser hev, çiqasî dike qirrîn, barrîn dest naçe ber destê zalim, destê Welî hela nawestin.

-Tu teyaq nakî ne? qancux...na, tu naçî, kolos li serê min heye, ezê ji postê we herduya duhêla rahêlim, bavê min hevt jin xweyî dikirin, lê ji wana yekê jî miqenetî li bavê minrra nekir, niha tê min bikî sosiret ,weyî tu qîza Mustê başewal. Erê, erê zirar tune pak-pak-zef baş.

Û gava ku Esmer bû meyît, bê deng û hiş li erdê dirêj bû, paşê Welî destê xwe jê kişand, çend serîya li nava odê çû hat, paşê Esmer ber xweba kir, danî ser doşeka rûniştina xwe û li kêlekê rûnişt.

Xêlekê şûnda Esmerê çevê xwe vekirin, notila merekî reş mêrê xwe li kêleka xwe dît, hêsir li ser çevê belek bûvûn gol, dilop-dilop di ser hinarê sûretê sorda dihatin xwarê, ber û bişkoka lê qetîyabûn û pêsîra kirêsrira zer memika, xwanê dikir.

Welî vê carê bi hêrsa danîyî nêzîkî wê bû, bawer bikî ew jî ketibû ber îske-îska, gava ku destê xwe stuyê Esmerra bir, lê hema bi wê hêrsê jî notila hirçê gelîya kîderê jinê kete ber, da ber ramûsana.

Esmerê ew şûnda def da.

-Axir tu çi duxazî? Bese tu qe zanî, wekî tu li çi? Dunîyayê dijîyî.

-Na Esmer, axir ruhê min teyaq nekir, çaxê ku min bihîst, wekî tu çûyî bi Kerîm ra ketî...ax de xWelî li serê min be.

-Axir seba çî wa?

-Xulese?

-Belê, hema ez ji wî hizdikim.

-Ji Kerîm?

-Belê ji Kerîm.

-Weyî xWelî li serê Welî be.

-Wa.

-Lo wekî usane, ez diha ne mêrim...

-Tu teze zanî, wekî tu mêr nînî.

Gelo wê deqê ji wê derbê xedartir hebû derb ku hate nav çevê Welî, hebû, gelo kêreke usa tûj wekî wê lezê ceger li Welî kerî-kerî kir, gelo di nava emrê xweyî sî salîda qerf û qareke usa li serê xwe dîbû, çewa ku îro jina wî ku ewî çar sala notila qîza bikir xweyî kiribû, ew gilîda dêt. Ew qar da sêrî, wekî ew nemêre.

Belê, ewî ewqasî xwe melûl û belengaz nedîbû. Ê aha di hundurr wîda xeberda kîna mezin, dijiminîyê, diha di wê oda çûkda tu tişt, tu tişt tunebû, wekî dilê Welî agir û şewata wî, hurrbûna wî sêkin bike, şewat û alava erinûsîya wî, ya kumreşîyê û dijminîyê. Welî cardin dada Esmerê, dest avîte pêsîrê kirasê çît, zîtol kir jorda anî xwarê, pêsîr û navkêla keçikê ma bê sitar, rût û tezî li ber Welî vebû, li ser sifetê qîzikêyî nazik dihat xwendin nehizkirin, kîna mezin û bi wêrra tevayî xwanê dikir sîng û berê nazike delal, yê ku digotin ser minrra bedew diha heramin, usa bû Esmer ew torrîna delal.

Esmerê teyaq neda. Çiqasî bi desta û linga mêr defda, lê ew notila merê teva biharê lêxe gerim bive, bi Esmerêba qemitî, da ber geza notila gurê har, neyînîkê xwe di kêleka, piştê û bedenêda kire xwarê, her neyîse kîderê ku destê Welî gihîştê xûn têda reş bû, ewî xwe ji hêrsa û kumreşîyê lap unda kiribû, kerb û kîna wî ew xurê wî boqeyî tenê bi veçîrrînê têr dibû, notila teyîrê sîmirr çewa ku kêwrîşkê dide lepa, ewî usa Esmer dabû ber lepa ji hev vediçîrrî, ewî notila xinzîrê beyanî sîqîn, bi diranê xwe xist, memîkê Esmerêyî sorî sipî ji bin destê wê kişand derxist, dev avîte diran lê dane hev usa kişand, wekî xûnê pelemîsk pêrra avît sifetê wî, û ewî notila pîrhebokê devê xwe kir xûna wê qîza qenc mêt, fena zûrî...

Vê gavê usa xweşe eva koxîkê kevin, usa bi teme eva teqt kesîbî kê m xarin, oh, Esmer notila mûrya dixebite û qe naweste. Her tişt di bin destê wêda tê guhastînê, werq û bedewîya teze distîne.

Li ser sirsûm diha toz tune, diha kincê Kerîm di nav dest û pîyada nînin, te qeyî digot ew herçar pezê sivderêda jî ji şabûna bi dil û eşq dikalin û bi kalîn deyîl berxê xwe dikin.

Şer û qinawuz diha piştê Esmerê naqimilînin, ne jî niq û ramûsanê Welî wê bînteng dikin, diha zûrrîn û errînê Welî nakevin guhê wê, naherrimînin.

Ji niha bi dengê zîz dike guvîn û roj li cem wan zû diçe ava. Hizkirina Esmerê diha taqet û qewetê dide Kerîm, notila berê ji xebatê zû eciz nabe.

Gava ku ro diçe ava û hîv notila sinîyê fire sifetê xwe vedike û rast li Kerîm û Esmerê dinhêrre, çîye? Tu qeyî dibêjî, erinûsîyê dike hela tu binhêrre, rast li wana dinhêrre û ji kumreşîya quloz dibe.

Kerîm serê mîya girtîye, lê Esmer didoşe, girêsa mîya di destê xweda digivêşe, fişe-fişa sire, dikeve dîzê vîyalî-wîalî difistiqe doranê Esmerê ciqîz dike.

Çava ku Kerîm diwestîya li ser mertekê pişt xwe rûdinişt û bi dilê têr li Esmerê dinhêrî: sifetê Esmerê wê gavê diha şimşatî qerqaş bû, ji wî şîrî qerqaştir, sûretê wê usa sor bûn, ji xûna ku du roj pêşda ji memkê wê pelekîşk avît, ji wê xûnê jî sortir bû, zatê çev û burîyê wê di dunyayêda tu qaru qusûr nedanîn ser xwe.

Hela gelek tişt di tofilê ruhê Esmerêda hebûn, emirê dunyayê hela hindik dabû wê, lê di hundurr wêda bê hesab eşqa jîyînê hebû, ew eşq roj bi roj zêde dibû, ew emrê ku ewê di nava çar salada buhart, emrê rezîlê bû, Esmer niha azaye, xwe û xerrêqê jîyînê çar sala emir li ber wê kiribû bîrî.

Ewê îro hela teze kitêbê Kerîm ku zivistanê di mekteba mezinda pê hînbûbû, ji hev derxistin lê nihêrî û ewê ji dilê xweda wekiland navê helfa “Elîfba” gelo kîjan? Helfe, axir ne navê wê Esmerê û bona nivîsara wê berê ewlin ew helf lazime...lê hela ew nikare bi dilê tamam rehet mijûl be, hela fikirêd şivelu, deqe-deqe mejûyê wê li hev dixin û notila sîke reş şuxul tîn li ber çevê wê lod dibin, axir ne Welî rihet nasekine, axir ne Welî ewqas bi kerb, bi devê kev gef xwarin wekî ji postê herduya wê “duhêla rahêle”. Gelo Kerîm karibe caba wê dijminîya wî bide, wekî ewqas tijîye, ewqas hare û bê binîye.... Hela birînê wêya dişewutîn, hela qursê reş di canê wêda tijîbûn, hela li ber çevê wê unda nebûbû hêrsa wî gurê har, wî hirçê gelîya.

Û Esmerê bi hizkirina bêbinî dinhêrî li Kerîmê guleş, deqekê dest lê dirricifin hindik dimîne di ber çongarra dîza şîr welgerre, ew ancax digire, bi ernûsî dîzê bi xweba digivêşe, deqekê texmîn dibû, wekî ew qeza ku jê disilkî, vaye şipûkê tîne serê wê, û ewê bi çevê keser li hîvê nihêrî, ya ku te qeyî digot bi eyêrif wêya dikene.... Gelo diqewume?.....hema ew bi xwe Welî bi wê hêrsa agirî, bi wan çevê har.... Vê carê dîz ji dêst firrî li erdê ket, şîrê sipî li erdê bû gol.....

-Belê şuxulê qewmandinêne, axir seba wê yekê Welî qîza Mustîyê mirrdarr çar sala xweyîkir, li ber çû-hat, bû dorgerrîmka wê, ji tamamîya jinê aqê nehîyê baştir xweyî kir, da wergirtin, û îro ew herre ber derê yekî notila Kerîmî tî birçî, wekî heval hogirê wî pê bikenin, qerfa pê bikin, erê ne? Wele, xweş bazare.

-Ezê duhêla rahêlim, duhêla û bi wan duhêla xulamê minê çarixê xwe bidurûn.

-Ax Welî, wax Welî, diqarrîya dicarrîya dîya Welîyê pîr, -dilê xwe meşkêne cihinimê gorr, wekî revî, dirrîya xwedê da be tu sax bibe, ezê dewsa yekê ji terra sê jina bînim, wekî qe Esmer nebe xulama yekê ji wan.

-Bavê min şîretê usa li min nekirine, qenc û xirab jina min gerek li berderê min bimire.

-Na Welî, vê roja mine pir reş neke, niha dunîya hatîye guhastinê, kes diha poz bi edetê mayî kevin nake.

-Axir çi? Şuxulê jina min bi dunîyayê ketîye....

Û Welî notila hirçê birîndar dierrîya, xwe li şel û pela dixist, lê gumana wî hatibû birrînê, ew du roj bû di xweda diqicqicî, lê rê nediketê, ewî lap xwe unda kirbû, xew nediket çeva, li ber hîverrona kêlek-kêlek vîalî vediqepicî, te qeyî digot şeverreşe bawîşk tênê.

Aha ewî ew cote bi jare didît, didît wekî ji xwe razîne, tenê namila Kerîm dimilmilî, lê ewî usa kubar û serbest xwe di ser çomêqa tewan dibû, te qeyî digot mîrê çîyane: Esmerê bi awurrê usa şîrin li Kerîm dinhêrrî, usa pêrra heyîrîbû, wekî di nava emirê xwe çar salada li kêleka Welî ew roj nedît, Welî hisreta xebereke wê şîrin ma, ew keser di dilda bû birîn.

Esmer, tu îro usa dibiriqî, usa bedew û nazikî wekî horî û perîyê nava cinetê jî ne wekî te ne, tu îro dil û cegerê Welî bi çaquya ko kerî-kerî dikî, diherrêşî, barûd û

serraçê bi dilê wîyî şewat dirreşînî, di nava temamiya Êl û Eşîra welatê Romêda tunebû jineke usa ji nava jina, heta bigire ji eyşîa horîya.... Erê, erê Esmer, wê lezê tu xwe şaş dikî ji şabûna, Welî zane, wê yekê pak zane, zane wekî tu li ser wî emirê xweyî bextewarîyê dirricifî, axir ne ew gişk bextreşîya Welîye, oh, wekî mecal biketayê Welî wê çewa bimêta xûha wê gerdena te bi xale xitan bimêta.... Na, na edet bi cûrekî mayîn hukum dike, lazime berê ewulin vî, vî şivanê ehmeq, wekî turuş neke ji nav kerîyê pêz derkeve tevî cêrga merîya nebe.... Û qema qetilê di destê Welîda werba dibû dibiriqî li ber pencê tevê û nişkêva Welî xwe ji cî dirêjî namila Kerîm kir...

Esmer vê carê bi sewuta zelûl dike qîrrîn, hêja Kerîm pê dihise, wekî neyînesîya sarbûna dest û lingê jinê bona çîye, dev delingê wê di şîrda mewujbûn....

Esmer bi reca û dîlek dike qîrrîn:

-Ax Welî....

Welî nayê zevtê, gava ku dibhîse qîrrîn û reca Esmerê, di xweda diwerime kaw dibe qemê di destê xweda li ba dike.

Kerîm notila piling ji cîyê xwe banzda li ser pê sekinî û mertekê bin xweda di destê xweda hilditeqiland, ew bû qedera nîvê nîv deqê, belê nîvê nêv deqê jî û Welî hesabê Kerîm dîbû.

-Eva çî gurekî du pêye, bi ekis, pê kenîya û bi xwe guman mertek jorda anî bîleka Welî, ku qeme dihejand.

Welî terrisî, qeme ji dêst firrî, bû şingîna wê, çû li sela ket, bû du perça, lê millê Welîyî hurr, notila hine goştê bê ruh, di kêlekêda daliqîya...

-Ha, ha, ha, -pê kenîya Kerîm, qema te jî ko bîye Welî....

Rewan

Sala1935

10.10.2011

Edoyê Simkoyê Mikoyê Elîyê Dûmanê Kelboyê Omo,
xelkê kela Makê ji bajêrê Qezvînê

18.07.1390

